

Îqame bo Fîlandayê nedaye te

Daîreya Koçberan biryareke neyînî li ser dawaya te ya penaberiyê daye. Ew tê wê wateyê ku te li ser bingehê penaberiyê îqame bo Fîlandayê wernegirtiye.

Eger te ji bilî dawa penaberiyê dawayeke cuda ya îqameyê kiribe, biryareke cuda li ser wê dê ji te re were.

Yekser behsa biryara xwe bo alîkarê huqûqî û karmendekî navenda penaxwazan bike

Alîkarê te yê huqûqî û navenda penaxwazan bi otomatîkî agahiyê ji biryara te wernagirin. Herwiha nûnera/ê te jî herdem biryarên derbarê te werdigire.

Ji alîkarê xwe yê huqûqî re bibêje ku te biryareke neyînî wergirtiye. Eger te alîkarê huqûqî tine be û yekî dixwazî, karmendên navenda penaxwaziyê dikarin alîkariya te bikin.

Giring karmendekî navenda penaxwaziyê haydar ku te biryarek ji Daîreya Koçberan wergirtiye. Karmendê navendê dikare hingê te şîret bike ka ji wê demê pê ve çî dibe.

Li mafê xwe yê karkirinê binêre

Ji biryarê lê binêre ka mafê te yê karkirinê hê jî maye. Di biryarê de tê gotin ka kengî mafê te yê karkirinê bi dawî dibe. Eger kar bikî, yekser bibêje xwedîkarê xwe eger mafê te yê karkirinê bi dawî bibe.

Agahiyên zêdetir derbarê mafê karkirinê li ser malpera me hene:
migri.fi/turvapaikanhakijan-tyonteko-oikeus.

Pişfî biryarê dikarî bi dilxwazî derkevî yan itirazê li biryarê bikî

▪ Vegerîna dilxwazane

Eger bixwazî bi dilxwazî vegeî welatê xwe, dikarî alîkariyê wergirî. Li ser wê li gel karmendekî navenda penaxwazan biaxive.

Şertê wergrtina alîkariyê ew e ku tu bi dilxwazî ji Finlandayê biçî. Divê ku tu dawaya xwe ya penaberiyê yan itirazên ku te li wê kirine betal bikî.

Agahiyên zêdetir derbarê vegeřina dilxwazane li ser malpera Daîreya Koçberan hene: <https://migri.fi/paluu>

▪ **Dikarî itiraza biryarê li dadgeha îdarî bikî**

Şîretên itirazkirinê bi biryara te ve didin te. Navê wê belgenameyê şîretên itirazkirinê ne. Eger bixwazî itiraz bikî, hewceyî alîkarekî huqûqî yî. Parêzer dê itirazê li ser navê te bike. Karmendên navenda penaxwazan alîkariya te dikin bo peydakirina alîkarekî huqûqî.

▪ **Dadgeha îdarî biryarê li ser itiraza te dide**

Eger dadgeha îdarî itiraza te red bike, dikarî dawa mafê itirazkirinê ji dadgeha îdarî ya bilind bikî. Ew lêkolînê li hemû itirazan nake. Gava ku êdî mafê itirazkirinê nemîne, biryar dibe dawîn.

Dadgeha îdarî û dadgeha îdarî ya bilind dikare

- biryarê biguheřîne
- emir bike ku dawa dîsa were meşandin
- emir bike ku îqame were dayîn yan
- itirazê red bike.

Gava itirazê li biryara Daîreya Koçberan bikî, êdî Daîreya Koçberan ne ew sazi ye ku mijara te dimeşîne.

Eger te pirs an agahiyên zêdetir li ser mijarê hebin, biaxive li gel alîkarê xwe yê huqûqî yan dadgeha îdarî ya ku mijara te dimeşîne.

Di biryarê de hatiye gotin ku kengî biryar dikare were bicihanîn

Li ser bingehê penaxwaziya te îqame nedaye te. Di biryarê de hatiye gotin ku kengî ew dikare were bicihanîn. Polîs berpirsiyarê bicihanîne.

Biryara derxistinê tê wê wateyê ku eger tu bi xwe dernekevî, polîs dikare te derxe.

Hevdem mimkin e ku qedexeya hatina welat li ser te emir kiribe. Ew tê wateya ku nabe tu vegeřî Finlandayê yan Herêma Schengenê. Qedexe dikare demkî yan heta biryareke din be. Ew di biryarê de tê gotin.

Polîs amadekariya vegeřandinê dike anku bilêtên firînê dikire û te digihîne ser sinorê Finlandayê yan heta welatê te.

Karmend dikarin emir bikin ku tu xwe ragihînî yan te bixin cihekî girfî

Polîs an karbidestên sinor dikarin emir bikin ku tu di demên diyarkirî de li navenda penaxwazan an polîsxaneyê xwe ragihînî. Ew dikarin herwiha te bixin cihekî girfî.

Beşa girtî cihekî wisa ye ku mirov nikare jê derkeve. Eger te bixin cihekî girtî, dê yekser sebebê wê ji te re bibêjin û derbarê meşandina mijara girtinê û imkana peydakirina alîkariya huqûqî (hiqûqî) bidin te.

Eger te sebebê nû bo dawakirina penaberiye hebe, dikarî dawayeke nû bikî

Eger te sebekî nû bo dawa penaberiye hebe piştî ku biryara Daîreya Koçberan bigihe hukmê qanûnî, tu dikarî dawayeke nû ya penaberiye bikî. Dawaya nû divê yekser dema ku sebeb an hewcehî hebe were kirin.

* Divê te sebebek hebe bo wê yekê ku çima te berê behsa sebebên nû nekiriye

Sebebê wê yekê, ku çima te pêştir behsa sebebên nû nekiriye, divê wisa be ku te bi xwe nikarîbe tesîrê lê bikî. Piştî wê Daîreya Koçberan dinirxîne ka lêkolînê li ser dawaya te bike yan na. Eger bi nêrîna Daîreya Koçberan te ti sebebên nû bo dawakirina penaberiye nînin, biryarek dê were dan ku lêkolînê li ser dawaya te nakin. Wê biryarê dê bo agahî bidin te.

Di hinek haletan de êdî xizmetên navenda penaxwazan nadin te

Eger polîs nikare te ji welat derxe lê tu dikarî bi xwe vegefirine welatê xwe, polîs yekser behsa wê ji navenda penaxwazan re dike. Piştî wê te 30 roj dem heye ku bi xwe ji welat derkevî yan dawa alîkariya vegefirina dilxwazane bikî.

Piştî wan 30 rojan, êdî xizmetên penaxwazan ji te re bi dawî dibin. Anku tu êdî nikarî li navenda penaxwazan bijî û pareyê penaxwazan yan xizmetên din yên navenda penaxwazan dide wergirî.

▪ Eger te dawayeke nû ya penaberiye kiribe

Eger te dawayeke nû ya penaberiye kiribe, xizmetên penaxwazan ji te re bi dawî dibin yekser gava ku polîs biryarê bide te. Wisa dibe eger te di dema dawaya pêştir de piştî biryarê 30 roj xizmetên penaxwazan di xizmeta te de bûn.

Agahiyê zêdetir wergire

- Ji malpera Daîreya Koçberan: migr.fi/turvapaikka-suomesta
- Vîdyoya Daîreya Koçberan ya "Biryara neyînî": migr.fi/videot-turvapaikanhakjoille